



Aniha gişt dikarin bèn vaksînekirin û vaksînê werbigirin

Ji ber çi vaksînekirina li dijî KOVÎD-19ê girîng e?

Vaksîn li dijî KOVÎD-19ê parastinê pêk tîne. Heke gelek kes bèn vaksînekirin:

- Kesine kêmtir dê tûşî vê nexweşiyê bibin.
- Dê kesine kêmtir canê xwe ji dest bidin.

Gelo divê ez vaksîne bibim?

Na, tu neçar nînî ku vaksîne bibî. Eva ku vaksînê lêdî an na girêdayî bi te bi xwe ye.

Gelo divê pere bidim?

Na, vaksîn jibo hemiyar bêpere ye.

Gelo vaksîn ewleh û bibandor e?

Erê, vaksîn bêxeter e. Her wiha lêkolînan nîşan daye ku vaksîn bibandor e. **Pisporên bijîşkiyê vaksîn li Swîsreyê piştrast kirine.** Wan vaksîn û bandorên wê lêkolîn kirine. Bi hezaran kes beşdarî lêkolînan bûne. Bi dehan milyon kes li seranserî cîhanê hatine vaksînekirin.

Gelo dûhatên vaksînê hene?

Weke her vaksîneke din, renga dûhatine vê vaksînê jî hebin.

Mirov prranî hesta westiyan, serêş an Tayê (germaya leşî) dikin. Her wiha renga di cihê ku derzî derbasî nav leşî dibe, ziyaneke çêbibe. Ev bertekên xwezayî ne ku renga bi lêdana vaksînê pêk bèn. Ewna pişkî ne û dê ji nav herin.

Kêmtir caran, mirov berteka cidîtir nîşan didin. Wek mînak, renga berteka alerjîk ji xwe nîşan bidin. Ev mijar renga derdem piştî ku tu vaksînê werdigirî biqewime. Û di wê demê da tu yê hîn li cem pisporên tendurustiyê bî.

Ez vê dawiyê tûşî KOVÎD-19ê bûme. Gelo divê ez vaksîne bibim?

Erê, heke tu zêdetirî şeşe mehên beriya niha tûşî vê nexweşiyê bûbî, divê vaksînê werbigirî.

Çi kesek nabe ku were vaksînekirin?

Heke tu bi hin metiryalkên heyî di vaksînê da hestiyar bî, nabe ku vaksînê lêbidî. Beriya pêkanîna vaksînekirinê, dê hin pirs ji te bèn kirin.

Ez li ku dikarim vaksînê werbigirim?

Tu dikarî li **dermanxaneyê** an **ofîsa bijîşk vaksînê werbigirî**.

Her wiha tu dikarî seredana **navenda vaksînekirina gelemperî** bikî, wek mînak li nexweşxaneyê an li Biyûlîyê (Beaulieu (Lausanne)).

Her wiha dê tîmek li wir be ku **seredana navçeya te bike**. Bala xwe bide ser posterên ku li taxa te hatiner daliqandin an ji navendekê ku nas dikî, lêzanînan werbigire.

Ez çawa dikarim demê terxan bikim?

Tu dikarî telefonî vê hejmarê bikî: **058 715 11 00** Kesek ku bi zimanê te diaxive, dê bikare navê te tomar bike.

Tu her wiha dikarî navê xwe di vê **Malperê** da binivîsî: www.coronavax.ch

Li navenda wergirtina vaksînê dê çi biqewime?

Destpêkê dê çend pirs ji te bînin da ku haya wan ji rewşa te derbarê raboriya hestiyarî an ducanîbûnê hebe.

Piştîra tu yê **vaksîna** xwe di beşa jorîn a baska xwe da werbigirî.

Berîya terikandina navenda wergirtina vaksînê **divê ku bi qasî 15 deqîqeyan** li wir bimînî.

Te yê mehekê piştîra hewcetî bi derzîlêdana duyem hebe, meger ku tûşî KOVÎD-19ê bûbayî. Dema ku li navenda wergirtina vaksînê yî, tu dikarî jibo derzîlêdana duyem, dema seredanê eyar bikî.

GIRÎNG: Heke taya te heye an halê te nebaş e, jibo vaksînekirina duyem neçe. Destpêkê testa KOVÎD-19ê bide.

Gelo piştî derzîlêdanê divê hema wisa maskê daynim?

Erê. Di dema niha da, **gişt** divê qanûnan bişopînin.

Ev **gelekî girîng** e ku maskê daynî û navbira fîzîkî digel kesên din berçav bigirî.

Ev baştirîn rê ji bo parastina wan kesan e ku nehatine vaksînekirin.

Gelo ez piştî wergirtina vaksînê dikarim biçim derveyê welêt?

Erê, lê pêwîst e ku tu qanûnên serdest li welatê ku dixwazî biçî wir, vekolînî.

Hîn jî pirsên min derbarê vaksînê hene.

Tu dikarî telefonî vê hejmarê bikî: **058 715 11 00**

Tu yê bikarî lêzanînan bi 9 zimanên din li www.vd.ch/corona-multilingue bibînî.

Her wiha tu dikarî vê **Kodeya QR** sken bikî.

